MAÇÊN SAVA

Dr.Arif Hîto

(1)

Min hemî xwenên xwe
Xewnên xwe yên hilawîstî
Bi dûf êkve girêdan
Kirine di destê bay da
Û... hezên xwe
Ewên hemî xoşewîstî
Mitkirin û veşartin û
Kirine di guhê gay da
Xewnan...
Nefî kirme di nav zengên ket-
warîda
Hezan..
Bi giranî êxistime di bin barî da
Demê xerîbiya vegerê
Mejîyê min yê nîv nivistî
hişiyar kirî
Ne xewn... xewnên min bûn
Ne hez jî.. hezên min bûn
Ezek bê xewn
Bê hez
Dê maçekê li rûyê kê dem?!

(2)

Lêvên te..
Şekir jê di barît û ne yên te
Gulleyên bera şekira rişti û gul-
leyanda
Sitranên kesk
Yên bê sernav
Kehî di bin û di zên û vedizên
Di bine çoyan
Xewneka kel.. ya bê jivan
Bi dizîkîve çavên min kirine
reşmal û
Têda nihî wek dotmîran
Xewna min ya mest û ciwan
Ewa sitiranên vegerê û,
Xerîbiyê ji min ra di gotin û
Qet ne hatî
Ewa çendîn caran sil boyî û,
Her roj hatî
Ey xewna sermedî
Ma tu xewinrojkî.. yan leşekê
gerim
Ma tu hêzeka germî... yan pey-
veka nerim
Ma tu ezî... yan jî terim
Di çavên minda di nivî û
Di destên minda di livî û...,
Mişti şerim.

(3)

Min rûyê gulekê birîndar kir
Hizaran birîn
Di leşê min yê birînoyî da azirîn
Min ronahîya rûyekî maç kir
Hizaran maç
Li ser lêvên min yên hişkboyî da
Êwirîn...

(4)

Saqî.. pêkekê işqê bîne
Mizeyekî ji maça û,
Sitiraneka evîniyê
Himbêzeka gerim û peyveka rastiyê
Ji hesta fîrhandî bi dirkîne
Jiyan... bêy maç
Qet ne jîne..

(5)

Supasiya min neke!
Ku min tu hebandî û,
Di çavên xwe yên bi ber çafikda Çandî..
Rêkên direj û pir meynet
Şevên sar û bi çirîset
Ayeta işqeka pîroz
Di nav berperên te da xwandî
Supasiya min neke!
Ku gul.. min ji baxê te ne çinîn
Sitêr ji eniya te ne kirin
Demê kêlbên birsa kojek
Di goştê min yê zivirda çoyin
Çi navên gerim, min ji mala te ne birin
Supasîya min neke!
Ku min xiyanet ne kir
Xewna te ya tazî di gel xwe ne bir
Doza te...,
Hegbeyet bû, li ser pişta min
Vexwarna te... ji xwîna min
Gopalê te.. ji nivêja min
Û.., bûna te jî, ji mirna min
Supasiya min neke!
Peyvên şirîn û direwîn..,
Ji min ra ne bêje
Avrûya minê pepîk û hejar
Ji dîtinê ne rêje
Çi sitiranên dî yên xoş ne darêje
Supasiya min neke!
Lê..,
Çi xencerên jehir kirî ji piştve
Ji piştve...,
Li min nede.